Zarokê Nimûne

Diyar Mustefa

Roj zarokekê nimûne bû û gelek yê xoştivî bû li qutabxana xo hemî heval û Mamostayan hez jê dikir, eger carekê te li qutabxanê guhê xo daba suhbetên Mamostayên wî, demê behsê jîrî û zîrekîya qutabîyan dikir, roj xudanê bara pitirîya wan medha bû.

Pirsyar ji rojî hate kirin, erê egerê vê zîrekî û jîrîya te çî ye?

Îna rojî bersiv da: Ez yê di malleka bêdeng û dwîr ji arîşeyan dijîm hemî encamên xêzana min rêzê li êk û du digirin, û her roj babê min demekî destnîşan diken pirsyar û danûstandinê li ser jiyan û xwandina min digel min diket, herwesan bi şev zor dinivim û spêdehîyan zwî ji xew radibim, û êkemîn karê min yê spêdehîyan didanên xo dişom da bêhna devê min xoş bît herwesan ser û çavên xo jî bi av û sabûnê dişom û digel dayk û bab û xwîşik û birayên xo têştê dixom û beref qutabxana xo bi rê dikevim, û li qutabxanê ez guhê xo dideme Mamostayên xo demê wanê şirove diken û çi tişt ji min naçin û eger di tiştekî yan peyvekê negehiştim, pirsyara Mamostayên xo dikem da ku dûbare min têbigehînît, û demê wanên min bi dûmahî dihên, beref mal diçim, piştî cilkên xo digihurim û dest û çavên xo dişom û firavînê dixom, êkser erkê xo yê mal bi cih di înim û didûv ra yarîyan dikem.

Rojane eve karê min e, jiber hindê ez yê serkeftîme di jiyana xo da. Hîvî dikem hemî zarok wekî min bin û wan karan biken yên ez dikem da ew jî ji wan kesan bin yên herdem Mamosta û dayk û bab jê di razî.